Kar û ciwanîya didana

A: Babê Newzadî

Mişkî got:
Didanên min di biçwîkin û tîjin.
Ez dişêm hemî corên zerzewatî û penîrî û dan û dikakî û heta asnî pê bixom.

Kêvirwîşkê got:
Didanên min di dirêjin.
Ez dişêm gêzera pê bixom.

Sivorey got:
Didanên min bihêzin û tîjin.
Ez dişêm gwîz û berrwî û binideqa pê bişkênim û kaklkên wan bixom.

Şêrî got:
Didanên min bihêzin.
Ez dişêm hemî corên goştî pê bixom.

Serdarî got:
Didanên min di spîne û ciwanin.
Ez dişêm hemî gava li nav hevala husa bikenim